



Ji 20.7 ve Dirêjtirîn Dema bo Biryardana li ser Dawayên mafê Penaberîtiyê 6 meh in

Qanûna nû derbarê dirêjtirîn dema biryardana li ser dawayên mafê penaberîtiyê ji 20.7 ve dest pê dike. Li gor wê qanûnê dawayên roja 20.7.2018 yan piştî hingê kirî divê di demeke ne dirêjtir ji şeş mehan de biryar li ser were dan.

Guherandina qanûnê bo dawayên ji 20.7.2018 ve kirî ye

Dema nû ya biryardanê bo wan dawayan e ku roja 20.7.2018 yan piştî hingê hatine kirin. Dema biryardanê ji hingê ve tê hejmartin, ku dawaya mafê penaberîtiyê radestî polîs yan karbidestên sinorî hatiye kirin.

Dema diyarkirî ya herî zêde 6 meh ne bo wan dawayan e ku berî roja 20.7.2018 hatine kirin. Texmîna biryardana van dawayan di hevpeyvîna mafê penaberîtiyê de bo mişterî tê gotin.

Di hin haletan de dema biryardanê dikare li gor qanûna nû jî dirêjtir be. Eger dema biryardanê ji texmîna di hevpeyvînê de dayî biguhere yan dema li gor qanûnê diyarkirî anku şeş meh ne bes bin, em ê mişterî bi taybetî agadar bikin.

Texmîna dema biryardana li ser dawaya xwe bi hesabîna li ser malpera Migri.fi bihejmêre

Mirov dikare texmîna dema biryardana li ser dawaya xwe bi hesabînkeke dema biryardanê ya li ser malpera migri.fi bihejmêre.